kurdnasîn

Çirye pêşîn/berçile 2002 Hejmar: 3 Sal: 1

# ÇEND GOTIN LI SER KAMPA CIWANAN

# LÎSTIKA HILBIJARTINÊ Û ŞANOYA DEMOKRASÎYÊ

# TÊKILÎYA KURDISTANÊ Û REWŞA IRAQÊ



# INTEGRATIE EN ZELFORGANISATIES

# CITAAT UIT DE 'PAARSE' DRUGSNOTA:(II)



www.arsivakurdi.org

Oktober/december 2002 Nummer: 3 Jaar: 1

## NAVEROK/INHOUD


5 ÇEND GOTIN LI SER KAMPA CIWANAN 5

7 LÎSTIKA HILBIJARTINÊ Û ŞANOYA DEMOKRASÎYÊ 7

9TÊKILÎYA KURDISTANÊ Û REWŞA IRAQÊ 9

11 INTEGRATIE EN ZELFORGANISATIES 11

13 CITAAT UIT DE 'PAARSE' DRUGSNOTA: (II) VERANTWOORDELIJKE MINISTERIES: MINSTERIE VAN VWS-MINISTERIE VAN JUSTITIE 13

20 RÊZIMAN - KIRDAR 20

HELBEST 22

PACEYÊN MAWZERAN XEMGÎN



Kurdnasîn organa KOÇ-KAK é ye.
u ji sê mehan careke derdikeve.

Kurdnasîn is een uitgave van KOÇ-KAK
Kurdnasîn verschijnt 4x per jaar.

**Redaksiyon / Redactie**
B. Baran
Leyla
Ferhat

**Xebatkar / Medewerkers**
X. Uso
Brûsk
Rojin
Zelal

**Pergela Rupelan / Grafische Vormgeving**
Şefik
Mehmet
Adar



**Navnişana Redaksiyonê / Redactie Adres**
KOÇ-KAK
Klarendalseweg 468
6822 GW Arnhem

**Navnişana Postê / Post Adres**
KOÇ-KAK
Postbus 1092
6801 BB Arnhem

**E-mail**
kockak@nistiman.com
redactie@nistiman.com


www.arsivakurdi.org

# ÇEND GOTIN LI SER KAMPA CIWANAN

B.Baran

Vê havînê, ji alîyê Komela Çanda Karkerên Kurdistanê KOÇ-KAK ê ve pirojek ji bona ciwanên kurdên li Ewropa hatibû amade kirin. Ez bixwe jî, ji bona çend bernamên vê pirojê, ji alîyê KOÇ-KAKê ve hatibûm vexwendin. Ji ber vê jî ez di hinek beşên vê pirojê de beşdar bûm. Loma ez dixwazim hinek li ser vê xebata hêja kurtenivîsek binîvisînim.

Vê xebata hanê wek helwest, helwestek gelek pîroz bû. Ji ber ku alîyek helwestê ew bû ku; ji gelek bajar û welatên Ewropa civandina ciwanan bû. Carek bêyî ku tu, tu agadarîyek bidî wan, ji ewçend deverên cuda hanîna ciwanên kurd û demek bi hevre mayina wan, hevnasîna wan bi serê xwe xebatek gelek hêja û serkeftîye.

Her ciwanek ligel hevnasînan, bixwaze yan nexwaze di vê demajoya bi hevre jîyanê de wê li ser rewşa xwe, rewşa welatê ku jê hatî ye, bajarê ku lê ye bipeyive. Ciwan bi hev re li ser xwe dipeyivin. Li ser mala xwe, xanîyên ku lê ne, jîyana nav bajêr û nav mala xwe ji hev re dibêjin. Ew rewşa çand û hînbûyinên xwe û civaka welatên ku lê dijîn didin ber hev û ji hev re dibêjin. Gengeşîyan li ser vê dikin. Ciwan xweşî û nexweşîyên têkilîyên xwe yên nav malbat û civaka kurd yên cîyên lê dijîn ji hev re vedikin.Ciwan gengîşîyên mezin û bi bandor li ser edet û hînbûyînên civaka kurd û welatên ku lê dijîn bi hev re vedikin, li gor xwe encamên hêja jê derdixin. Di nav van gengeşîyan de gelek caran xeletîyên xwe yên di nav malê de ku kirine jî dibînin. Di van gengeşîyan de gelek caran ew lêborînên xwe, yan jî hêrsên xwe yên ku ji dilên wan tê, lê qet ji kesê re venekirine jî, ji hevalên xwe yên nure vedikin.

Dibe ku tiştê li bajarê ku lê dijî, yan jî welatê ku lê dimîne her çend li ser jîyana wî/wê bandorên mezin jî danîbin bala wî/wê qet nekişandibe jî, lê gava ji rewşa welatek din, ji rewşa bajarek din, ji rewşa civakek din, tişt dibihîse û li ser wan gengeşîyan dike ew tiştên ku berê bala wî/wê qet nekişandibûn jî, jêre dibe tiştek balkêş. Ciwan ji nû de jîyana xwe, têkilî û tevgera xwe ya di nav malbat û civaka kurd û civaka welatê ku lê dijî dide berhev. Ciwan bi vî hawî gelek çetir him çewtîyên xwe û him çewtîyên civaka derdora xwe dibîne. Lê ew ciwan ne tenê çewtîyan dibîne, her weha pêwistî û girîngîyên bi hevre jîyana malbatî û civakî jî dibîne, hêjayîyên wan çetir dibîne.

Her weha ew ciwan dinav têkilîyên bihevreyî de hînê bandora jîyana malbatî ya civaka kurd li deverên cuda dibin. Ew bixwe dibinîn ku bandora çand û hînbûyinên welatên cuda çawa bandora xwe li ser ciwanên kurd yên wan deveran kirine. Çawa kurdên ji navçeyek Kurdistanê dibin bandora jîyana welatek din de diguherin. Ew ciwan vê guhertinê di cudabûn û hînbûnîyên cuda yên di navbera xwe de gelek vekirî dibînin, li ser gengeşî dikin, tiştên nû hîn dibin.

Di vê bûyera hanê de min dît ku cîwanên kurd yên ji welatên cuda hatine hinekan hev berê jî dîtibûn, lê yên din berê qet hev nedîtibûn. Lê germayîya navbera wan, têkilîyên wan, gengeşî û lîstikên wan ên bihevreyî, bala wana li ser hev ew çend nêzik bû, germ bû ku, meriv digot qey van ciwanan bi hevre mezin bûne, hevalên hev ên zarokîyê ne.

Gava min, li gor fersendan, yeke yek lênêrînên wan li ser vê xebata KOÇ-KAKê ji wan hinekan dipirsî; wan bi germayî kêfxweşîya xwe danîn ziman, Wan dida zanîn ku ew gelek tiştên nû hîn dibin, ew dibin xwedîyê balkêşîyên nû. Lê hinek nerazîbûnîyên wan jî hebûn; çi bi piranî, çi jî yên hinekan tenê. Nerazîbûnîyên wan yên herî xwurt ji, kurtbûnîya demê bû. Ew ewçend dilşadbûn ku nedixwesten ev dem kuta bibe. Lê yeke yek hinek ji ciwanan ji disiplîna li ser wan jî ne razî bûn. Tiştek xwezayî ye ku ciwan azadîxwazin û gelek caran disiplînên pêwist jî wek tengkirina azadîya xwe dibînin. Lê gava egerên disiplînê ji wan re dihat vekirin û gengeşî li ser dihat kirin, wan jî bawerî bi vê displînê dinîn. Tiştek din balkêş jî ew bû ku bi giranîya ciwanan dixwestin ku temenê beşdaran pir nêzikê hev be. Dema ji hev qetyana wan dibû sehneyek trajîk, wan ciwanan qet nedixwest dawî li demê were û ew ji hev dûrkevin. Ji ber wê jî ger bi deqan be jî çend dikaribûn dem dirêj dikirin!!

Ciwan bi hêvîbûn ku ev derfetên weha her ssal li deverên cuda bên amade kirin, da ku ew firsendan bibînin pirsgirêkên xwe û yên civaka xwe gengeşe bikin, bi gelek alî ve bibin xwedîyê agahdarîyên nû.

Helbet xebatek weha berfire gelek xweş hatibe amade kirin jî bê kêmasî nabe. Lê van kêmasîyan li ber serkeftinan û bidestxistinan qet nexwîyabûn nediketin berçavan. Ji bona xebatek weha berfire karek dirêj û giran pêwist e.

www.arsivakurdi.org

# LÎSTIKA HILBIJARTINÊ Û ŞANOYA DEMOKRASÎYÊ

Xalit

Dewleta Tirk xwe ji bijartinê re amade dike. Gava ku meriv li rewşa Tirkî ya rasti binêre, ji dema ku Komara Tirk ava bûye û heta niha, li Tirkî tenê şanoya demokrasîyê tê lîstin. Herkes dizane ku li pişt perdê ya rastî, dewleta Tirk mîlîtarîzm û hêzên li gorî daxwaza mîtarîzmê tevdigere îdare dike.

Vê dewleta, li ser mêtina kedê, rêtina xwînê, talan, zilm û zora li ser karker, gundî û gelan ava bûye. Loma ji bo xwe li pêya bihêle, timî pêwîstî dîtîye ku xwe têxe bin basikê dewletên bi hêz. Ji bo ku mêtinkarî û kedxwarîyek bêînsaf tê meşandin jî, ji alî leşkeran ve rişma rejimê timî ragirtî tê hiştin. Gava kînga pêwîstîya wan pê çê bibe "demokrasî"yê tînin û gava daxwaza maf û edaletê tê kirin, wê "demokrasî"yê zêde dibînin û bi serwerîya mîlîtarîzmê ya vekirî ji holê radikin.

Piştî derba leşkerî ya12 Îlonê 1980 û pê ve bi Konseya Ewlekarî û qanûnên dijî demokrasîyê, berê hinek selehîyeta ku di destê hukumetan de hebû ew jî ji destên wan girt. Armanca vê derbê, muxalefeta şoreşgerî li Tirkî û ya netewî li Kurdistanê ji holê rake, pere, mal û milkê ku di destê dewletê û gel de heye di destê sermîyandarê mezin de bicivîne.

Piştî şerê 15 salan, her çend tevgera bi navê Kurd şer dikir, bi yekalî dev ji bernama xwe berda û stratejîya xwe guhert jî, lê ji alî din ve dewleta Tirk, di warê aborî, civakî û sîyasî, beramberî qrîzek kûr ma. Li gorî min, ji xwe ev daxwaza Emerîka û Ewropa bû jî, ji bo ku dewletên emperyalîst çekên xwe bifiroşin û dewlemendîya herêmê bikin parçekê sermîyanê xwe, loma pêwîstîya wan bi darbên leşkerî, bi şerekî dervî (mîna şerê Iraq û Îranê an Kuwêtê) xwe an nav xwe heye. Li dewletê mîna Tirkî, ku qrîza aborî û sîyasî ya kronîk heye, ji bo xapandina gelan, hertim pêwîstî bi lîstika hilbijartinê, bi şanoya demokrasîyê heye.

Hilbijartina Mijdara 2002 an jî perçakî lîstika şanoya dewleta Tirk ya demokrasîtîyê ye. Partîyên, di hundir çerçova qanûnên ku vê lîstikê li dar dixe, hatine damezirandin jî, rola xwe bi profesyonelî dilîzin. Li gorî vê tabloyê, dîmena sîyasî ya li tu welatên dinyayê nehatîye dîtin, em li Tirkî dibînin: mîna ku bawerîyên çep, rast û dîndar di yek partîyê de bi rêxistin bibin, an di yek partîyê de cîh bigirin; mîna ku an partiyên rast an nîjadperest û çep bi hev re koalîsyonek bi aheng ava bikin.

Dewleta Tirk, berî belavbûna Bloka Rojhilat, di dema Şerê Cîhanê yê Sar de, li hemberî hevalbendê xwe yên Emerîkî û Ewropî, tevgera çep ya radîkal, mîna qozekî xeterê rê dida, bi vê sîyasetê ji wan alîkarîya sîyasî, leşkerî û aborî distend, lê tucar nedihîşt tevgera çep ji bin kontrolê jî derkeve. Wê demê tevgera îslamî jî mîna qozekî yedek digirt. Piştî ku Bloka Rojhilat belav bû, êdî çepên radîkal tirpan kir û tevgera îslamî geş kir.

Tevgera îslamî, bi sêalî bikar anî: ji bo parastina rejima xwe ya li hemberî îslamê ku hem tevgera îslamî di bin kontrolê de bigire, hem jî mîna hespekî truva yê nava îslamê bi kar bîne; ya din li hemberî hevalbendên xwe yên Rojava, ji bo ku bi her awayî ji wan alîkarîyê bigire, mîna qozekî ku xetera desthelatîya Tirkî bigirin

destê xwe, hatine rêdan; ya din jî li hemberî hêzên îslamî ku nedihatin kontrolkirin û tevgera Kurd ya netewî pirr bi xurtî bikar anîn. Dewleta Tirk di vê sîyaseta xwe de jî, heta niha serfiraz bûye.



Mîna ku wek ne di bin kontrolê de dihat dîtin, tenê tevgera Kurd bû: her çendîn ku berî '80 yî kontrolek qismî ya dewleta Tirk hebe jî, xwanê ye piştî '80 yî tevgera Kurd ya netewî bi sîyasetek kûr û dûr û pirhesab, xist bin kontrola xwe. Dewleta Tirk, tunekirina tevgera Kurd ne tenê li Bakurê Kurdistanê, li her sê parçên Kurdistanê yên din jî xist hundir armanca xwe. Loma dewleta Tirk, li gorî vê armancê ket hundir tevgerek û lîstikên pratîk.

Di hilbijartina Tirkî ya mijdardê de, xwanê ye li Tirkî rola partîya îslamî (Partîya Spî) û li kurdistanê jî ya DEHAP'ê dertê pêş û ev jî tam li gor daxwaza dewletê ya ku ji bo gelê Tirk û Kurd manuple bike pêk hatiye. Mirovên ku xwe li dora partîya îslamî dicivîne û dixwaze dengê xwe bidê, beşek zehf zen dike ku ev partî li hemberî rejimê ye, bi rastî wê guhertinekê çêbike.

Ji alîyê Kurdan ve, her çend bawer nekin ku wê DEHAP tiştekî bi dest bixe û tu guhertinê çê bike jî, lê gelek Kurd bawer dikin ku ev partî li hember dewleta Tirk e, an Kurd e û di eslê xwe de rizgarî-ya Kurdistanê dixwaze; loma wek tepkî dixwazin dengê xwe bidin vê partîyê.

Heger li Tirkî û Kurdistanê tevgerên alternatîf yên berjewendîyên gelê Tirk û yê Kurd cuda cuda heşkere temsîl dike hebana, ji bo Tirkî demokrasî û azadî, ji bo Kurdistanê rizgarîya netewî biparastana, tu rola van partîyan jî nedima. Lê heta ku alternatîfên rastî û berpirsiyarên gelê Tirk û Kurd yên rastî derneyên holê, wê her du gel jî ji alî dewleta mêtinkar û mijokdar bên eciqandin û wê ji alîyê partîyên naylon jî bên xapandin.

www.arsivakurd.org

# TÊKILÎYA KURDISTANÊ Û REWŞA IRAQÊ

Baran

Her dewletek dema tê ava kirin li ser hinek hîman tê avakirin. Van hîmên ku dewlet li ser ava dibin li gor rastîya xwe ya jîyanê çend bingehîn bin ewçend guherandinên wan zor in. Lê ev hîm ne bingehînbin jî; yanê bi hawek jixweber jî hatibin danîn dîsa guherandinên wan ewçend neasanin.

Wek mînak Tirkîyê liser hîmên ne bingehîn yên jixweber çêkirî hat avakirin; yanê li ser hîmên înkar kirin û pişavtinên gel û neteweyên din hat ava kirin; lê ji heyştê salî bêtir e tevî ewçend zordanan jî nehat guhertin. Ne tenê nehat guhertin ne li gor hîmên xwe lê li gor berjewendîyên hêzên dinê peywendî û girêdanên wan guherandin ne asan e jî.

Piştî şerê dinê yekemîn dewletên emperyalîst gor berjewendîyên xwe navçe li hev par kirin û lê bicî bûn. Divê parvekirinê de welatê Ereban û Kurdan hat perçekirin û parvekirin. Ev parvekirin ne li gor hîmên coxrafî bû, ne li gor hîmên dîrokî bû, ne li gor hîmên olî bû û ne jî li gor hîmên netewî bû.Yanê parvekirin ji hîmek bingehîn dûr bû, tenê berjewendîyên dewletên emperyalîst û hinek dewletên mêtinkar yên navçê li ber çavan hat girtin.

Lê welatê Ereban tevî geşkirinên nexweşîyên olî, mezhebî û êlî be jî li gor berjewendîyên xwe dewletên Ereb li ser ava kirin û li dû xwe hîştin. Lê mixabin welatê Kurdan yanê Kurdistan ji dewletên heyî û yên çêkirî re bexişandin. Yanê Kurdistanê nav Tirkîyê, Îranê, Iraqê û Sûrî de parve kirin û ji wan re bexişandin. Li gel vê pirsgirêkê, pirsgirêka Ereb û Cûhîyan jî geşkirî hîştin.

Di vê navçê de dewletek ji van dewletên çêkirî jî dewleta Iraqê bixwe ye. Dewleta Iraqê jî wek her dewletek din di avabûnîya xwe de xwedîyê hinek hîmên taybetî ye.



Van taybetîyên dewleta Iraqê jî zûbizû nayên guhertin. Iraq ji avabûna xwe ve xwedîyê sê hîm û sê pirsgirêkên bingehîn hat ava kirin. Ev ji alîyek ve pirsgirêka mezhebên sûnî û şîîtîyê ye û ji alîyê din ve herçend beşek Kurdistanê jê re hatibe bexişandin jî xwedîyê pirsgirêka navbera netewa Kurd û Ereb e.

Dema Ingilîz ji Iraqê vekişîyan ev hersê hîm di hevîrê avakirina dewletê de bicîkirin û vekişîyan. Herçend bicî kirina van hîman ne bi hawek mafdarîyek rast e û ne bi hawek wekhevî ye jî, lê wek hîm hebûnek gelek giring e. Ew nerastdanîna hîman ji avabûnê ve buye egerê xwîn rêtinek mezin û ji bona netewa Kurd buye egerên qirkirinên pir mezin. Lê ji ber ku Kurd jî hîmek ji hîmê dewletê ne, di avabûna her rist û desthilatdaran de jî Kurd hatine hesibandin û di quncikek hesaban de hatine bicî kirin.

Ji avabûna Iraqê û virde gelê Kurd ji bona sererast kirina mafê xwe û bicîkirina hebûna xwe ku wek hîmek bingehîna vê dewletê bi gelek dijwarî têkoşîn daye,

xwîna xwe rijandîye û hêjî dixebite. Di demajoya vê têkoşînê de bidestxistina otonomîya 11 îlona 1970 yî jî gavek gelek girîng e, ew jî bû egerê hinek firekirin û cîwarkirina mafên vî hîmî. Piştî vê rewşa dîrokî, li hevketina şerê kendavê û pêkhatina vê firsenda hêja ku ji 1991 ê virde, jîyana Netewa Kurd li vê beşê Kurdistanê dibin sîbera hêzên çakûç de be jî bi hawek xweser, pir û pir girîng e.


Deh sal bêtir xweser jîyan, xweser avakirina rista rêvebirî di her warê jîyanê de. Vê jîyan û guherandinan bi hawek fermî dibin pejirandin û parastina Yekîtîya Netewan de pêk hanîn gelek û gelek girîngtir e.

Li gel vê li darxistina dewleta Federe ji alîyê Parlamentoya Kurdistanê ve, guhertinek nû û gavek gelek girîng e di sererast kirina hîmên Iraqê de. Pejirandina Federasyonê ji alîyê mixalefeta Iraqê ku dibin sîbera Emerîka de tê geş kirin jî xweser gavek hêja ye.

www.arsivakurdi.org

# INTEGRATIE EN ZELFORGANISATIES

## Ferhat



Begin december 2002 heeft de gemeente Arnhem de nota "Minderheden in Arnhem" gepresenteerd. Het college van Burgemeester en Wethouders heeft deze nota geaccordeerd en op 16 december 2002 is deze nota in de Raadcommissie Maatschappelijk welzijn behandeld.

De gemeente Arnhem heeft na eigen onderzoek geconcludeerd dat "het minderhedenbeleid in Arnhem heeft gefaald".

In deze nota wordt het volgende vastgesteld:

1. het opheffen van de gemeentelijke Adviescommissie Minderheden

2. het beëindigen van de gemeentelijke subsidieregeling voor allochtone zelforganisaties m.i.v. 1-1-2004

3. het huidige beleid en daarop betrekking hebbende subsidieregeling Vredesvraagstukken en Ontwikkelingssamenwerking (VRONT)

De gemeente Arnhem vindt dat zelforganisaties geen wezenlijke bijdrage hebben geleverd aan het integratieproces. Daarom hoeven zij ook niet meer gesubsidieerd te worden. Hun functie als intermediair is beperkt en dit is geen argument meer om zelforganisaties subsidie te geven.

Bij de vorige evaluatie van het minderhedenbeleid in 1996, heeft het college van B&W, bij de vaststelling van de nota "Herijking Minderhedenbeleid Welzijn" besloten om subsidieregeling voor de zelforganisaties te wijzigen.

Daarop heeft de gemeente besloten om aan zelforganisaties subsidie te verstrekken voor ontmoetingsactiviteiten. De gemeente heeft de zelforganisaties schriftelijk medegedeeld dat zij met de subsidie van de gemeente Arnhem geen integratieactiviteiten hoeven te organiseren.

In dit artikel zal ik me beperken tot het beëindigen van de subsidie voor zelforganisaties. Het is wel goed dat om de zoveel jaar een beleid geëvalueerd wordt. Het evalueren van een beleid heeft alleen zin wanneer deze evaluatie op juiste feiten wordt gebaseerd.

De gemeente beweert dat de zelforganisaties geen wezenlijke bijdrage hebben geleverd aan het integratieproces. Het is toch vreemd dat de gemeente Arnhem 4 jaar geleden tegen de zelforganisaties gezegd heeft dat zij de gemeentelijke subsidie niet voor de integratieactiviteiten te hoeven gebruiken en nu worden zij als zondebok aangewezen voor het mislukken van het minderhedenbeleid.

De gemeente concludeert dat de verantwoordelijkheid van het mislukken van het integratiebeleid bij de zelforganisaties ligt. Dit is naar mijn mening een

www.arsivakurdi.org

heie makkelijke en niet op juiste feiten gebaseerde conclusie. Als het beleid gefaald heeft, wie is hiervoor verantwoordelijk? De zelforganisaties of de gemeente?

Heeft het minderhedenbeleid inderdaad gefaald? Wat waren de doelstellingen van het minderhedenbeleid? Was integratie een van de doelstellingen van het beleid? Of heeft de gemeente in 1996 verkeerde doelstellingen vastgesteld? Er zijn ee heleboel vragen die beantwoord moesten worden voordat de gemeente het beleid had geëvalueerd.

Omdat al deze vragen onbeantwoord zijn gebleven, zijn ook de conclusies van evaluatie niet compleet.

M.i. waren de doelstellingen van het beleid en de doelstellingen die ten grondslag van de evaluatie liggen niet het zelfde. De kern van het minderhedenbeleid was het organiseren van ontmoetingen en het organiseren van activiteiten die te maken hebben met beleving van eigen cultuur en identiteit.

De kern van de evaluatie en van de nota "Minderheden in Arnhem" is het integratieproces en mislukking van de integratie. Dit is net een vergIijking tussen appels en peren. De gemeente had bij de evaluatie moeten aangegeven of de zelforganisaties conform minderhedenbeleid hebben gehandeld of niet.

De Manier waarop de gemeente met de allochtonen en de zelforganisaties omgaat is ook heel opmerkelijk. In Nederland is heel gebruikelijk voordat een beleid ontwikkeld wordt, ook met de doelgroep en de belanghebbende te communiceren. Maar als om de allochtonen gaat, worden zij er niet bij betrokken. Met allochtonen wordt dit meestal achteraf medegedeeld.

www.arsivakurd.org

# CITAAT UIT DE 'PAARSE' DRUGSNOTA:(II)

## *VERANTWOORDELIJKE MINISTERIES: MINSTERIE VAN VWS MINISTERIE VAN JUSTITIE*

**RISICO'S ALCOHOL GEBRUIK:**

***- AFHANKELIJKHEID:***

* Je raakt niet zomaar afhankelijk van de alcohol. Daar gaat vaak een lange tijd overheen. Je loopt risico als je alcohol gaat gebruiken om van stemming te veranderen. Je hebt steeds vaker alcohol nodig om vrolijk te worden. Of om je angst kwijt te raken, of om spanning te kunnen verdragen.

* Ondertussen went het lichaam aan de alcohol. Je moet hierdoor steeds meer gaan drinken om het gewenste effect nog te voelen. Elk jaar meer dan het jaar daarvoor.

* Als je niet drinkt krijg je last van lichamelijke klachten (onthoudingsverschijnselen). Om die klachten niet te voelen ga je opnieuw drinken. In deze fase levert het drinken steeds meer problemen op.

* Je krijgt ruzie met familie en vrienden, problemen op werk, school en met je gezondheid. Om deze problemen te vergeten begin je weer met drinken. Op een gegeven moment is er dan controleverlies. Je bent niet meer in staat om te stoppen.

* Als je drinkt voor het effect en je hebt tegelijkertijd een forse tolerantie ontwikkeld, moet je dus heel veel drinken om de roes te voelen. Dat verklaard waarom het ook zo moeilijk is om met mate te drinken. Als je weinig drinkt voel je het effect ook niet!

***- LICHAMELIJK:***

* Het lichaam went aan de alcohol en heeft steeds meer alcohol nodig om het gewenste effect te krijgen. (tolerantie)

* Een geroutineerde drinker kan veel drinken zonder zichtbaar dronken te zijn.

* Maar ook bij ervaren drinkers gaat het reactievermogen omlaag.

* Ook zij kunnen bij 2 drankjes niet meer deelnemen aan het verkeer.

* Het lichaam geeft vervelende reacties bij het minderen of stoppen met alcoholgebruik. Zoals slecht slapen, transpireren, misselijkheid, angstig en gespannen worden. (onthoudingsverschijnselen)

* In ergere gevallen kan je gaan trillen, toevallen of een delirium tremens krijgen. Bij een delirium tremens heb je hoge koorts en je ziet dingen die er niet zijn, b.v. beestjes op de muur.

***- GEESTELIJK:***

* Je bent geestelijk afhankelijk als je steeds sterker naar alcohol gaat verlangen en je jezelf niet meer prettig kunt voelen zonder alcohol.

* Je hebt een allesoverheersende behoefte aan alcohol.

* Je hele denken en doen wordt volledig bepaald door de alcohol.



**LICHAMELIJKE RISICO'S ALCOHOL GEBRUIK:**

* Lichamelijke risico's betreffen vooral de organen. De (giftige stof) alcohol beschadigt de organen.

* Daarnaast zorgt een tekort aan vitaminen, door de slechte voeding bij veel drinken, voor schade aan het lichaam. (vitamine B 1)

***- LEVER:***

* Leververvetting: kan al bij enkele dagen flink drinken. De vetlever herstelt zich als je stopt met drinken.

* Bij langdurig drinken kan de lever ontstoken raken: alcoholhepatitis. Dan kan geelzucht optreden. Kenmerkend is dat het oogwit ook echt geel is.

* Blijf je doordrinken, dan worden levercellen vernietigd en vervangen door bindweefsel. Dit heet levercirrose. De lever is dan vergroot. Levercirrose herstelt niet meer.



***- HERSENEN EN ZENUWSTELSEL:***

* Langdurig overmatig alcoholgebruik plus slecht eten kan schade aanbrengen aan hersenen en zenuwstelsel.

* Je kan vroegtijdig dement worden. Dit kan variëren van vermindering van het geheugen tot het optreden van het 'Korsakovsyndroom' (kan ook al optreden bij jonge mensen die 6 weken feesten in de zomervakantie)

* De zenuwbanen worden aangetast, je hebt last van tintelingen en prikkelingen in voeten en vingers. (medeoorzaak= gebrek aan vitamine B 1)

***- SLOKDARM, MAAG EN DARMEN:***

* Ontstoken slijmvlies van de slokdarm, maag en darmen door overmatig alcohol gebruik. Door alcohol te drinken verdwijnen de klachten tijdelijk. De ontsteking wordt verergerd.

* De spijsvertering is hierdoor vaak verstoord.

* Spataderen rond de slokdarm. (door stuwing van het bloed door een vergrote lever)

* De slokdarm kan hierdoor makkelijk gaan bloeden. (met ernstige gevolgen)

***- KANKER:***

* Er is verband aangetoond tussen alcoholgebruik en kanker. Met name kanker van de mond, de keel, het strottenhoofd en de slokdarm.

***- HART EN BLOEDVATEN:***

* Door alcoholgebruik kan een verhoogde bloeddruk optreden.

***- ALVLEESKLIER:***

* Door alcoholgebruik kan een chronische ontsteking ontstaan van de alvleesklier. Dit kan ontaarden in kanker. (Pancreatitis is chronisch en pijnlijk)

www.arsivakurd.org

***- ZWANGERSCHAP:***

* Alcoholgebruik tijdens de zwangerschap is schadelijk voor het ongeboren kind.

* De baby's zijn te klein en hebben vaak hersenafwijkingen en hartklepgebreken.

* Ook matig alcohol gebruik kan vertragingen in groei en geestelijke ontwikkeling tot gevolg hebben.

**ALCOHOL DE WERKING:**

***- OPNAME:***

* Alcohol wordt direct via de maag en de darmen opgenomen in het bloed.

* Via het bloed wordt de alcohol opgelost in het lichaamsvocht en verspreidt het zich door het hele lichaam.

* Alcohol begint te werken zodra het de hersenen bereikt.

* Hoe meer lichaamsvocht iemand heeft , hoe meer de alcohol wordt verdunt.

* Vrouwen hebben gemiddeld minder lichaamsvocht dan mannen. Zij zitten daarom sneller aan een hoger alcohol percentage.

***- AFBRAAK:***

* Het overgrote deel van de alcohol moet worden afgebroken in de lever. Dit gebeurt stapsgewijs.

* Alcohol wordt omgezet in een giftige stof (Acetaldehyde).

* Dit gif wordt omgezet in azijnzuur.

* Azijnzuur wordt afgebroken tot kooldioxide en water.

* Deze stoffen verlaten via de urine het lichaam.

* De alcohol zorgt ervoor dat je meer vocht kwijtraakt middels de urine, dan je tot je hebt genomen. Gevolgà dorst.

* De afbraak van alcohol in ons lichaam gaat langzaam. De lever heeft 1½ uur nodig om een glas alcohol af te breken.

* Dus na 6 glazen alcohol heeft je lichaam 9 uur nodig om de alcohol kwijt te raken. Dat werkt dus door tot de volgende morgen.

* Een kater is het gevolg: hoofdpijn, brandend maagzuur, misselijkheid, braken, een droge mond en hevige dorst.



www.arsivakurdi.org

**ALCOHOL DE EFFECTEN:**

***SNEL NUCHTER WORDEN??***

* De afbraak van alcohol in ons lichaam kan niet versneld worden.
* Het nemen van een koude douche helpt niet.
* Vitamines slikken helpt niet.
* Iets eten of zwarte koffie drinken helpen echt niet.
* Sneller nuchter worden?? Vergeet het maar!

***IN HET BEGIN............................EN OP HET EIND***

* Effect van alcohol hangt sterk af van de hoeveelheid.
* Bij één of twee glazen werkt het opwekkend. Je wordt actiever.
* Je voelt je alert, ontspannen, vrolijk en je praatmakkelijk.
* Ook je eetlust neemt toe.
* Bij drie tot zeven glazen verandert je stemming en je gedrag.
* Je wordt opgewonden en zorgeloos of agressief. Je zelf kritiek neemt af.
* Je gaat dingen doen die je als je nuchter bent niet zo snel zou doen.
* Je reactie snelheid gaat omlaag.
* Dagelijkse handelingen (Ook autorijden) lijken makkelijker te gaan, maar is beslist niet zo.
* De kans op ongelukken is heel erg hoog.
* Bij acht of meer glazen worden de negatieve effecten versterkt.
* Je gezicht wordt rood en de pupillen verwijden zich.
* Je wordt misselijk en gaat braken.
* Je zintuigen zijn verdoofd. Je gaat dubbel zien, moeilijk lopen en lallerig praten.
* Je raakt totaal in de war.
* Je kan een 'black out' krijgen. Je herinnert je de volgende dag niets meer van wat er is gebeurd.
* Meer dan 20 glazen is levensgevaarlijk. Je kan bewusteloos worden, in coma raken en zelfs overlijden.



**RISICO'S VAN BLOWEN:**

**HASJ - WIET MARAHUANA JOINT - STICKIE**

De werkzame stof heet: **Tetra Hydro Cannabinol.** THC. De sterkte van deze stof verschilt per hasj / wiet soort.

* Rook van joints of stickies bevat 6 à 7 maal meer kankerverwekkende stoffen dan de rook van enkel tabak.

*    De THC vermindert het concentratievermogen, het reactievermogen en het korte termijn geheugen.

*    Bij hoge dosis (meerdere keren blowen per dag) kans op: - Angstgevoelens,

- neerslachtigheid, - paniek en flauwvallen ('out gaan')

*    Blowen kan leiden tot: Het verwaarlozen van contacten en het uitstellen van plannen.

*    Door blowen kan je onvoldoende aanspreekbaar zijn.

*    Bij dagelijks blowen wordt het moeilijker om te stoppen.

Door blowen kan een eerdere 'bad trip' ervaring (b.v. door een papertrip met LSD) opnieuw weer naar boven komen.

**RISICO'S VAN XTC & ANDERE PILLEN**

*    Je weet nooit wat en hoeveel je van een middel binnenkrijgt: kans op overdosis.

*    Er is sprake van gevaarlijk gebruik wanneer je het vaak en teveel doet, zodat je de signalen van je lichaam niet meer voelt.

*    De combinatie met veel dansen geeft een grote kans op oververhitting & totale uitputting.

*    Het slikken maakt overmoedig & agressief.

*    Het tast de coördinatie aan.

*    Het geeft een stijf gevoel in kaken en spieren: 'strak staan'.

*    In combinatie met andere middelen gevaarlijk.

*    Bij veelvuldig gebruik nemen de gewenste effecten af en de ongewenste effecten toe.

*    Kans op depressies en angstaanvallen.

*    Onduidelijkheid over schade van zwaar en langdurig gebruik op de lange termijn.

**HET JUNKIESYNDROOM:**

In eerste instantie beschreven over de aan heroïne verslaafde junk.

***Definitie:***

Extreme moeilijke 'patiënten'. Ze zijn onbetrouwbaar. Chanteren en manipuleren. Ze kunnen eindeloos doordrammen als ze hun zin willen hebben. Ze onttrekken zich aan alle verantwoordelijkheid, behalve voor die zaken die direct verband houden met het verkrijgen van hun drug, of het geld daarvoor.

Toegedicht aan emotioneel verwaarloosde mensen

***Nadere analyse:***

*    Dit syndroom kan zich ook ontwikkelen bij mensen die voordien in geen enkel opzicht van de norm afweken.

*    Het gaat om een vorm van aangeleerd, 'negatief', in ieder geval destructief intermenselijk gedrag.

*    Er is sprake van een algemeen menselijke reactievorm, optredend bij schaarste van een geliefd en noodzakelijk product.

www.arsivakurdi.org

***Voorbeelden:***

* Tijdens de periode van drooglegging in de Verenigde Staten bij alcoholisten hetzelfde gedrag.

* Tijdens hongersnood een zelfde soort gedrag en handelen waargenomen.

* Het sterke schuldgevoel dat overlevenden van concentratiekampen vaak hebben, vloeit in veel gevallen voort uit schaamtegevoelens, over wat zij onder druk van de extreme omstandigheden ten nadele van hun medegevangenen hebben gedaan.

* Primitieve stammen die tengevolge van overheidsmaatregelen in vrij korte tijd in extreem behoeftige omstandigheden raakten. Sociale structuren van gastvrijheid, betrouwbaarheid, medemenselijkheid verdwenen. Er ontwikkelde zich een volslagen ander patroon van intermenselijke relaties: uitsluitend gericht op het overleven van het individu. Onderlinge liefdes banden ontbraken, een band tussen mensen bestond uitsluitend indien beiden er voordeel van hadden (het zogenaamde twee-egoïsme)

* Bij leden van geheime diensten, spionnen en dubbelspionnen. Het begeerde goed is: informatie over de 'vijand'.

Het gaat in de hier opgesomde gevallen in feite steeds om hetzelfde:

> BIJ EEN GROEP MENSEN DIE DOOR DE OMSTANDIGHEDEN GEDWONGEN MET ELKAAR LEVEN EN OPTREKKEN, BESTAAT GROTE BEHOEFTE AAN ÉÉN BEPAALD PRODUCT.
>
> HET FEIT DAT DIT PRODUCT MOEILIJK TE VERKRIJGEN EN SCHAARS IS, GAAT HUN GEDRAG EN HANDELEN BEPALEN.
>
> DE INTERMENSELIJKE RELATIE WORDT INSTRUMENTEEL, DE MEDEMENS WORDT SLECHTS BEOORDEELD OP HET CRITERIUM: BRUIKBAARHEID.
>
> VOOR VRIENDSCHAP, EMPATHIE EN LIEFDE IS GEEN PLAATS MEER. ERVOOR IN DE PLAATS KOMT HET LIEGEN TEGEN EN GEBRUIKEN VAN DE MEDEMENS.
>
> MEN IS: EXTREEM EGOÏSTISCH, SLECHTS UIT OP EIGEN VOORDEEL, HONDSBRUTAAL, IN DE ANDER DÓÓRDRINGENDEN ZEER ONBESCHEIDEN.



**WAT IS DE RELATIE TUSSEN SEXUALITEIT EN MIDDELEN GEBRUIK EN ANDERSOM?**

***ALCOHOL:***

Alcohol gebruik als middel tot contact leggen ---> door de roes onveilige sex.

***SOFTDRUGS:***

In een kleine groep softdrugs roken - erbij horen, en een bepaalde intimi-teit met elkaar hebben, drempel tot experimenteren met sexualiteit is laag. Door de roes is de kans op onveilige sexualiteit groot.

***XTC:***

xtc is de 'love drug' bij uitstek, men gebruikt hem om uiteindelijk dé liefdesnacht te beleven.

***COCAÏNE:***

Ook cocaïne is een lust opwekkend middel, bij gedoseerd gebruik raak je erg opgewonden en kan je een orgasme lang uitstellen, en dus lang van de sexualiteit genieten. Bij teveel gebruik ben je erg opgewonden en geil maar kan je niet klaarkomen.

***HEROÏNE:***

Heroïne is een verdovend middel, het verdooft ook de lustgevoelens. Heroïne verslaafden hebben geen zin in sexualiteit, mannen kunnen zelfs geen erectie meer krijgen.

Met mag duidelijk zijn dat de harddrugs heroïne en cocaïne hun effecten hebben in de prostitutie.

Middelen gebruik met als onderliggende problematiek sexueel misbruik, leidt in veel gevallen bij vrouwen tot prostitutie. De bekende voorbeelden zijn de heroïne prostituees. Deze vorm van prostitutie wordt terecht geassocieerd met straat prostitutie. Echter ook in de raam- en clubprostitutie is het gebruik van middelen heel gewoon. Alcohol en cocaïne worden veel gebruikt.

Sexualiteit is een vorm van betaalmiddel. Meisjes kunnen gechanteerd worden tot sexualiteit bij opgelopen schulden. 'Vriendjes' gebruiken eerst mooie woorden, prachtige beloften en veel aandacht, om later hun 'meisjes' met geweld en onder dwang aan te zetten tot prostitutie.

www.arsivakurdi.org

# rêziman - kirdar

## PÊŞEDEM

Peyva ku pêşedemê dîyar dike, peyva "**dê**" ye. Ev peyv di zimanê devkî da pirranî wek "**ê**" tê karanîn.
Awayê tewandina kirdaran di pêşedemê da wek nûdemê ye; tenê li şûna "**di-**" pêşeka "**bi-**" tê karanîn.
Di awayê neyînî da, li şûna "**bi-**" "**ne-**" tê karanîn.

| | *ereni* | *neyînî* |
|---|---|---|
| kirin | Ez **dê bi**kim. | Ez **dê ne**kim. |
| çûn | Nermîn **dê** îro **bi**çe Amedê. | Nermîn **dê** îro **ne**çe Amedê. |
| birin | Şîrîn **dê** zarokan **bi**be dibistanê. | Şîrîn **dê** zarokan **ne**be dibistanê. |
| xandin | Ez **dê** vê pirtûkê **bi**xûnim. | Ez **dê** vê pirtûkê **ne**xûnim. |
| xastin | Kurd **dê** mafên xu **bi**xazin. | Kurd **dê** mafên xu **ne**xazin. |
| nivîsîn | Rojda **dê** helbestan **bi**nivîse. | Rojda **dê** helbestan **ne**nivîse. |
| xebitîn | Alan **dê** şemîyê **bi**xebite. | Alan **dê** şemîyê **ne**xebite. |
| dizîn | Diz **dê** kîsê jinikê **bi**dize. | Diz **dê** kîsê jinikê **ne**dize. |
| gîhîn | Em **dê bi**gîhin tirênê. | Em **dê ne**gîhin tirênê. |
| şandin | Em **dê** hevalekî **bi**şînin. | Em **dê** hevalekî **ne**şînin. |
| revandin | Korsan **dê** balafirê **bi**revînin. | Korsan **dê** balafirê **ne**revînin. |
| şikandin | Ew **dê** îskanan **bi**şikîne. | Ew **dê** îskanan **ne**şikîne. |
| ... | | |

**Kirdarên sazber:**
Di pêşedemê da, jibo kirdarên sazber, karanîna "**bi-**" ne pêwist e.

| | | |
|---|---|---|
| dadan | Ez **dê** sobê dadim. | Ez **dê** sobê da**ne**dim. |
| vegerîn | Şîlan **dê** roja şemîyê vegere. | Şîlan **dê** roja şemîyê ve**ne**gere. |
| vêxistin | Adar **dê** lampê vêxe. | Adar **dê** lampê ve**ne**xe. |
| berdan | Ew **dê** girtîyan berdin. | Ew **dê** girtîyan ber**ne**din. |
| rûniştin | Em **dê** li ser paldankan rûnin. | Em **dê** li ser paldankan rû**ne**nin. |
| rêkirin | Em **dê** mêvanan rêkin. | Em **dê** mêvanan rê**ne**kin. |
| dûrketin | Ew **dê** ji vir dûrkevin. | Ew **dê** ji vir dûr**ne**kevin. |
| girêdan | Dayik **dê** porê keça xu girêde. | Dayik **dê** porê keça xu girê**ne**de. |

www.arsivakurd.org

Paceyên mawzeran xemgîn

kon
mûyê reş yê bizina ye
çar dîwar
û bi stûna wê ya navîn ve
daliqandî disekine çeka me
me vê çeka
radest nekir qet.

her rêçik
qurmê mazî
rasta zozanan
dîtin şerê me..

ji zilmê re sîper sînga me
lêvgula min
ji zalim re mertal

me hûnand xelekên zincîran
agirî
koçgirî
dêrsim
sason
zîlan
bi xwîn der dibe dilgeºîya min

di xaniyên ji axê de
ku me mirin bi derhem ji wan qewirand
yên bi herîyê me ew seyand

paceyên mawzeran
xemgîn...
xencera xayintîyê
kun kir parsûyên me
encax.
di zimanan de stranên me
di dest de çekên me
destbirakîya me
di germîya xwîna teze de ye
xayintî
we ji pişta xwe derbê bixwe!

Edîp Çelîk



www.arsivakurdi.org

# HET OOSTEN

Er waren honderdduizend luizen
op de lakens, in kleding
als een grazende kudde schapen.
Zij zijn een deel van het leven.
Daar is het Oosten. Luizen,
aardbevingen, en pijn.
Onze grootste vreugde is een stuk brood.
Een handjevol sintels heet 'hoop'.
Het overschot sneeuw, blubber en mest.
Zwart bloed overspoelt de nachten.
Vloeiende dood, vloeiende wanhoop.
Een vlammende zonnestraal,
het blaffen van honden.
Hanegekraai, dat neerhangt als schemering.
Dat is het Oosten! Impasse, stilte en pijn.
Daar is de roos een veldbloem.
Een maaltijd bestaat uit wilde rabarber
en de wortels van kruiden.
De wortels des doods vloeien uit de hand
van een geliefde.
Dat is wat je gedronken hebt en
zal blijven drinken.
Dat is het Oosten.
Als de hoofden van geslachte schapen
zo zijn de ogen van mensen hier.
Liefde, warmte en zachtheid
zijn al duizenden jaren in liederen bewaard.

**Ahmet Arif**

www.arsivakurdi.org